

Welat

01/10/2014

Çandî - Gîştî - Serbixwe

14



Welat

ŞENGAL...

rondikek li zuhabûnê digere

PEYVA WELAT

Şengal ..tirajîdiya sedsalê

Aras Yûsiv

2

Ev demeke û birînên din di hiş û dilê Kurdan de li her deverê vedibin, ev birîn tev Şengalîne ku her yek ji wan di sinc cinavê Kurdan de bobelatên ku bi ser miletê Kurd de hatine vedgerînin bîra mirov, li ber bûyerên wisa tirajîdî gelo dê peyv karibin çi bêjin an çi bikin?

Gelo dema di ragihandinê de pirsra çîrokeke xemgîn dikn, ku bi serê Şengaliyekî hatibe çi ku zarok, ciwan, jin, mêr, pîremêr an dapîrekê hatibe dê ji êşa birîna wan û me sivik bike yan na..?

Ji sedî sed ev tirajîdiyên ku li Şengalê dermafê Kurdên Êzidî de çêbûne divê ku veşartî nemînin, û ji her saziyeke Kurdî yan ragihandinê tê xwestin ku van çîrokan bi raya giştî re parve bikin da ku were naskirin Kurdên Êzidî û Kurd bi giştî rastî çi zordariyê hatine û tîn ji ber em di demekê de dijîn ew dema ragihandinêye ku dikare gelek zextan li deverên biryarê ên cîhanî bikin ...

Di demên wisa hestiyar de, ji dîroka gelê Kurd ku ji ber ol an netewa wî rastî qirkirinê tê, ya tê xwestin ku ev bobelatên bi serê wan

Kovara **WELAT**
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Xweşnav Heso
Helbest Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî

Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpîrsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

de tîn divê ne tenê di hundirê ragihandina Kurdî bimînin lê ji me tê xwestin ku em karibin bi çi zimanê em zanibin vê êşê vebêjin da êşa me nemîne tenê êşeke Kurdî...

tê xwestin ku cîhan jî vê êşê bi me re rahêjê û sînorekî ji tîrora ku rêxistina DAIŞê bi navê Islamê dike êdî deyne.


Peyv jî dikare rolekê wek rola guleya şervanê Kurd li eniyên şer li Şengalê di ber dijminên mirovahiyê bilîze, lewra bela em bi hev re ji êşa Şengalê nêzîk bin û cîhanê têxin ber berpîrsyariyên wê li hemberî qirkirina ku li dermafê Kurdên Êzidî de tê kirin.

تَبَّيُّ ثَوْرَة
adopt a revolution



Parastina zarokên me, parastina gelê me ye.

Mihemed Zekê Mihemed



3

Weke tê Zanîn, nifşê nû li cem hemî milletên cîhanê, hêviya pêşerojê ye, ji ber vê yekê guhdaneke mezin li wan tê kirin, da ku li ser kesayetiyê serbixwe bêne perwerdekirin.

Li nik gelek miltên pêşketî, roja yekemîn ji sala xwendinê, rêvibir û mamosteyên wan pêşwaziya wan dikin, silavê li wan dikin, ji wan re dibêjin:

Emê saleke nû bi hev re bibûrînin, hêviya me ewe, ku em tev bi kêf û şadî vê salê bi hev re bidomînin, dema ku em tev bi çavê hevaltî û biratîyê li hev binêrin.

Em dizanin ku mirov nikare ji her kesî hez bike, lê em hêviyan li ser avadikin, ku hûn bi rêz bi hev re bidin û bistînin, hûn hev ne êşînin, bi vî rengî emê saleke bi şadî bi hev re derbasbikin, di heftiya pêşî de emê we hênî şeweyên ku alîkariya we bikin, ta ku tev bi rêzdarî li hev binêrin û sala xwe berdewam bikin.

Ji wan şeweyan mîna girûpên bo çareserkirina têderxistinokan (mamik) hwd, û car bi car endamên wan girûpan diguherin ta ku bi hev şêrîn bibin, ev li hêlekê, li hêla din ji wan re dibêjin, kirête ku mirov bi havalên xwe bikene û henkên xwe bi wan bike, nemaze ew kesên ku kîmasî di wan de peyda dibin, ji ber ku bandora xwe li rewşa wanî derûnî dike, xwendekarên xwe li rêzgirtin û demokrasîyê xwedî dikin.

Lê li cem me, zimanê me qedexe

bû, dibistanên me tinebûn, zarokên me li dibistanên Erebi dixwendin, ji loma gelek asteng didêtin, ta ku hînî zimanekî nû dibûn, ji bilî vê jî, şeweyên perwerdekariyê li cem me ne demokrasî bûn, cudawazî di navbera xwendekarên Kurd û Erebi de hebû, tevî ku lêdan qedexe bû, lê mixabin li gelek deveran bikar dihat, ev li hêlekê, li hêla din xebateke bê westan dihat kirin, da ku mejiyê zarokan bişon, û Kurdîtiya wan di çavên wan de reş bikin, hestê netewî li cem nifşê pêşerojê biçilmisînin û pûçbikin, ev ji bilî rewşa aborî ya zor û dijwar a ku li ser milletê me dihat ajotin, û encama **sejimara awarete** (bê nasnamekirin) bandoreke xurt li gelê me kir, û hişt ku pareke mezin ji milletê me zarokên xwe ji dibistanan derînin, ji ber ku şandina wan bê sûde didîtin, ev bû sedemeke serke ku zarokên me di temenkî biçûke de ketin bi kar de, û hin bi hin dûrî malbatên xwe diketin, û rê û şivîlên çewtiyê li ber wan vedibûn.

Li hemberî van bûyer û kiryanan erk û stûbarê me tevane, ku em li çarena bigirin, da ku em nifşê xwe yê nû biparêzin, dibe ku sûde ji xalan bête dîtin:

1-Encama van kiryanan ji dê û bavan re bête şîrovekirin, ta bighêjin baweriyê ku ev kiryar bi mebesta dûrxistina zarokên me ji xwendinê bû.

2-Em li zarokên xwe xwedî derkevin, zû bi zû wan bi kolanan de bernedin, wan nexin bi karên giran de.

3-Hez kirina zimanê dê û dîroka Kurdî di giyanê wan de biçînin, di riya çîrok û stranên folklorî re, bê gumane, ku her kalemêrek an pîrejineke Kurd pirtûkeke folklorîye, û di van salên dawî de gelek nivîsar û pirtûk ji bo zarok û nifşên nû hatine çapkirin, nemaze yê (Mihemed Emîn ,Erselan, malbata Celîl.....), û dansîna Mûzîka

Kurdî ya resen bi nifşê nû.

4- Rola gelê Kurd di avakirina şaristaniya Rojhilata Navîn de, pir bilind û berz e, tevî hewildanên bincilkirinê.

5- Nivîskar û helbestvanên me ne kêmtirî yên miletên cîhanê ne (Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Şerfxanê Bedlîsî.....).

6- Di dirêjahiya dîrokê de, gelê Kurd gelek kar û xebat û mêrxasî kiriye, ta xwe ji êrîşên biyaniyan parastîye, mîna mêrxasiya Kurdan di Kela Dim Dimê de, bi serkêşîya Xanoyê lep zêrîn û gelekên dîtir.

Dema ku mirov ji xwe re rezekî biçîne, û berê rezê xwe ne parêze û av ne de, guhdarî û nobedariyê li rez neke, bê guman ewê tu berî jê nexwe, nifşê nû jî mîna rezekê ye, eger mirov lê xwedî dernekeve, ewê li ber pêlan here, ji loma em dibêjin, **Parastina zarokên me, parastina zarokên me ye** ■




MEYXANA **DIL**

Hozanê girkundê

Tu di dilê her xeyalê de
 Wêneya peyameke
 Gemkirî di hejîne
 Û eşqeke avis di kûrahîya
 Her êşêde Çîroka xewneke koçber
 Di guhê yezdanekî penaber
 Dixwîne...tu ..dibe roj ..tu dibe şev
 Tu dibe ..gemî .. ji bona
 Hêviyek peritî
 Ji bona sêwîyekî bê hiş
 Û dîlekî dîn
 Li ber dergêhên payizê
 Bihna buhareke winda
 Pars dike
 Tu dibe meyxaneke
 Bê derî hêdî hêdî
 Bi ser bejna serxweşiyêde
 Dilop dike
 Giyanekî bê hest kenekî xav
 Bêkirinek bê can
 di himbêza wijdanekî
 kûrde di afirîne...
 tu her dimeşe
 gelek demsal bûne kirî
 Û qevdên xweziyan
 di qelîstekên dîrokêde
 dawerivîn
 lê tu ma
 Û tê bimîne
 Ne surîşt dikare rengête

Bi dize
 Û ne zemîn dikare
 Te di hundirêxwede
 Veşêre ...
 Û ne xweşîkbûn dikare
 Xweşîkbûna te
 Bi revîne...bi revîne ey meyxana
 Dilêmin ■



Nivîskarên Kurd û bandora Partiyên Rêzanî ...

Raman Îsa

Nivîskar û rewşenbîr li her deverê di Cîhanê de, ew ramanên milletê xwe ne, nexasim milletê Kurd ji despêka dîrokê de û civaka Kurdî bi tevahî ji kevnaya dîroka xwe û ta bi demsalên dawî, di bawerîya me de zengîntirîn milete di warê civakî, çand, û rewşenbîriyê de.

Û di Civaka Kurdî de pir kesên xwedan pêûs û raman hene, belê ji van kesan tê xwestin di vê demê de bêtir, ku di warê sazkirina civakê de bixebitin, lê eger mirov bi taybetî li ser rewşa nivîskarên Kurd raweste, tê xuyakirin ku pir kêmasî di karê wan de peyda dibin, gelo sedemên van kêmasiyan çine? an ku çi astengî li pêş van kesan heye, bi taybetî di dema ku perçebûn rewşa hêzên rêzanî yên Kurdî be.

bê guman dema ku nakokî di navbera hêzên rêzanî de gihîştibe asteke bilind, gelo li vir rola rewşenbîr û nivîskaran ta çi radeyê pêwîste, û ewê karibin Bandoreke erênî di warê yekrêzî û yekîtiyê de bikin an na. Lê wek tê xuyakirin ku, diyare tu hewildan di vî warî de ji aliyê nivîskarên Kurd bi giştî nehatiyê kirin û sedem ewe ku beşekî mezin ji van kesan bandora partiyên rêzanî li ser wan heye.

di derbarê van pirsgerêkan, û li gorî nerîna hin ji nivîskarên Kurd li Hesekê, di hevdîtinên taybet de li gel kovara Welat..

* Di despêkê de, mamosta Salih Heydo bersiv da û got :

“Nivîskar hestê millet e, nivîskar ramana millet e. nivîskar cinavê millet e, nivîskar xwediyê doza millet e, lê ev gotin tenê tê gotin, û di cîwariyê de naye çesibandin, partiyên me mixabin ta niha dûrî hev in û ramanên wan cudane û şerê hev dikin . li vir dema ku nivîskar bi rolekê rabe an ku xêrxwaziya bike, û hewl bide ku hêzên rêzanî bigihên hev, an jî wan rexne bike di nîvsandinên xwe de, ewê hewildanên wî bèn piştguhkirin” .



* Ji aliyekî din ve mamosta Bavê Serbest, di derbarê vê pirsê wiha axivî

Welat: (tu wek kesekî nivîskar bi çi awayî rola nivîskarên Kurd dinerixîne bi taybet di mijara nakokiyên ku di navbera partî û hêzên rêzanî de?)

-”Mixabin gelek ji me rewşenbîran ketine bin bandora partiyên rêzanî, û di bin wê bandorê de car caran dikevine şaştiyên de, bê guman pêwîste ku em bi rola xwe rabin di warê yekîtiyê û yekrêziyê de, da ku em bibin pir di navbera partiyên Kurdî de, û em karibin lihevkerinekê di navbera wan de bikin” .

* herwiha di derbarê vê pirsê, Mamoste Salar Sailih ragihand :

“Kêmasiyên me pirin di vî warî de, ji ber ta niha tu destpêşxerî ji aliyê me nehatiyê kirin, ku bi hev re em karibin yefşekê li hêzên rêzanî bikin, û pêwîste ku em di vî warî xwedî roleke girîng bin, ji ber di dema îro de mijara herî girîng yekîtiya hezên rêzaniyên Kurdî ye” .

wek tê xuyakirin di hevdîtinan de, ku bi giştî nerînan wan ne cuda ne, û rola nivîskarên Kurd ji aliyê wan bi xwe bi rengekî neyinî tê nerxandin, lê pirs ku tê kirin ewe:

gelo ta çi radeyê dê kesên rewşenbîr û nivîskar di bin bandora partiyên de bimînin, di dema pêwîstiya Yekrêziya helwesta partî û rêzanî Kurd?! ■

Nanpêjgeha Miftî

Salar Salih

Her sibehê şîniyên taxa Miftî bê par ji xewa şêrîn radibin û berê xwe didin nanpêjgeha Miftî ta ku nanê zikê xwe bidestxînin, nanpêjgeh li orta taxê dikeve, hîn kirîza bidestxistina nan wek arîşeyek rojane xwe dide pêş, tabûrek dirêj ji mirovan, jin û mêr li pêşiya nanpêjgehê radiwestin li hêviya ku nanê xwe peyda bikin, hin ji wan mirovan ji demjimêr 2:00ê sibehê tên ber pencera nanpêjgehê û li wir rûdinên ta ku dest bi belavkirina nan dibe, jiber metirsiya wan ku nan bidest wan nekeve.

Lê carnar gelek ji wan kesên ku bi demjimêran li hêviya nan dimînin, nan bidestê wan nakeve û neçar dibin diçin nan ji firoşkeran dikirin bi nirxekî buha, ev bûye sê sal kirîza kêmbûna nan li bajarê Hesekê derketiye, sedemên wê jî ne diyarin, li gorî ku xwediyê nanpêjgeha Miftî "Mihyedîn" dide xuyakirin ku rêveberiya Erzaqên Hesekê tibaba arvan li ser wan kêmkirîye ta astekê ku gihştiye nîvê tibaba ku berê ji wan re dihate terxankirin, û çaxa ku arvan ji cureyê baş be, beşek ji tibaba wan tê dizîn, bi hemû şiyânên xwe Mihyedîn hewl dide ku nan bighêja hemû şîniyên vê taxê û belavkirina nan bi rêxistin dike li gorî pilêtên ku bi vê armancê çêkirine, lê ewê çawa bike, naçarin ku her roj hin kes bê nan bimînin çimkî tibaba arvan pir kême û têra şîniyên vê taxê bi giştî nake, Mihyedîn rewşên xelkê jî bi çav distîne, ew fermanberan û mamosteyan û xwendekaran berî mirovên di derbasdike û nanê wan dide wan, bi mebesta ku li ser kar û dibistanên xwe dereng nekevin, riftara wî li gel mirovan bi giştî pir başe, ew bi bêhneke fireh danûstandê bi wan re dike li tev zehmetiya karê wî di dabeşkirina nan de bi renekî dadmend di navbera şîniyên vê taxê de .

Lê tevî ew sîstema ku xwediyê nanpêjgehê daniye ji pilêt û rêza li ser pencera belavkirinê, şêlûbêlek mezin çêdibe û ne tabûrek tenê lê du-sê tabûr li rex hev li ser pencerê çêdibin, qerebalixek mezin peyda dibe, carnar hevdu dehf didin û dikevin qirka hev de, lê tiştê balkêş ku zû li hev tên û arîşe mezin nabin çimkî xelkên vê taxê hemû hev dinasin, ez bi xwe carekê li ser pencerê bûm gava ku hevdu dehf dan destê mirovekî birîn

bû piştî ku li pencera nanpêjgehê ya hesin ket, lê sipas ji xwedê re ku birîna wî sivik bû, carnar jî ku hevdu dehf didan mirovek ji nav wan dipekiya û li ser xakê diket, yan jî nema dikarîbû ji tabûrê derkeve piştî ku nanê xwe distand.

ev hemû ji sedema ku nan pir kême û her kes ditirse ku bê nan bimîne, yan jî naçar bibe ku nanê buha bikire di vê rewşa aborî ya aloz de, dema ku nan pir bibe yek asteng nabin, lê kêmbûna nan ew sedema vê şêlûbêl û qerebalixê ye li ser nanpêjgeha Miftî.

Diyardeya kirîza nan ne tenê li nanpêjgeha Miftî derdikeve, lê ev kirîze li tevaya nanpêjgehên bajarê Hesekê derdikeve, ji bilî kêmkirina tibaba arvan ji hêla rêveberiya Erzaqan, rûyekî din ji vê kirîzê re heye, ku piraniya nanpêjgehan nema bi renekî yeksane nan difroşin mirovan, ew nan li ser hinek kesan belav dikin, ku her yek ji wan bûye berpirsyar di ber belavkirina nan de li taxekê, yan li beşekî ji taxek mezin.

mixabin gelek ji van kesan ne xwedî sîcin û nanê xelkê didin firoşkeran ên ku bi nirxekî buha wî nanî difroşin xelkên vî bajarî, bi vî rengî pêdiviya mirovan ji nan re wek xwarinek serekî diçewsînin, ji ber nebûna çavdêriyê ■



Qeyrekeçîtî

Sedûn Sîno

Dibe ku hevjiyanbûn xewna her keçekê be dema ku ew digihêje temenê wê, û gelek keç hene ew bi xwe li hevjiyanê xwe digerin bi şêweyeke xwezayî.

Lê gelek caran ev xewn û pîlan raserî kirîzan tên û ne li gorî rojevê ne, yan jî bendên civakî dibine astengî ji pêkhatina van xewnan re. Ta ku gelek ji wan dem li wan dibuhire û wisa ji zewacê dimînin.

Diyardeya qeyrekeçîtiyê ne diyardeyeke nuhe di Cizîra Sûrî de, lê belê ew gelek hêviyên keşan şikandiye û êdî jiyana li ba wan bê wate ye.

gelek sedemên vê diyardeya civakî hene, 'Solîn Êmo' keçeke ji Dirbêsiyê ye nêzî 30 salî ye wisa li ser sedemên qeyrekeçîtiyê axifî:

"rewşa welêt bi giştî dibe sedema sereke ji wê re, û encamên wê tenê li ba keçê xuya dibin, çimkî keç girêdaya guhertinên civaka xwe ye".

'Kamîran Şêxmûs' ciwaneke bi temenê xwe bêhtirî 30 salî ye wisa dibêje:

"Di nerîna min de mercên ku mirovên keşan li pêş xortan dideynin gelekî dijwar in, ji qelenên buha, nîrxên giran ên cil û aheng û mal .. hwd

ew in ên ku dibine sedemên sereke ji vê diyardeyê re".

Qeyrekeçîtiyê di civaka me de girêdayê mêjî û şêweya ramanên milletên me ye, wisa 'Sîham Derwêş' dibêje, yek ji wan dema ku pismam dikeve rêya dotmama xwe de, û ew bi wî

ne razî ye yan jî dilê wê ji wî re naxwaze. ew keç wisa bê zewac dimîne û herwiha pismam dizewice û jiyana xwe bi meraqê xwe berdewam dike, û keç dibe qurbaniya vê nerîtê (adetê).

Hin keç jî hene ku ew bi şensê xwe bawer in, û qayîl in dema ku ew pêrgî şensê zewacê nayên, di heman demê de jî gelek hene ku gazindan ji rewşê dikine ku ewe sedema nezewaca wan, bi taybetî jî koçkirina xortan ji welêt. û wisa li xwe dinerin ku ewê ji zewacê bimînin. ■

Ebdul-Xaliq Şêxmûs (Zozanî) peykervanê paşguhxiştî

Lawikê Romî

Li bajarê Serê Kaniyê, taxa Zor ava, şêwekar û peykervanê bi nav Ebdul-Xaliq Şêxmûs (Zozanî) mala xwe kiriye wek kargehek taybet bo karê hunerî û şêwekariyê û hemû cûreyên peykervaniyê.

Zozanî yê ku 39 salî ye, ji temenê 11 salî dest bi hunera azad kiriye, di destpêkê de wek şêwekar û paşê xwe pêşvebir ku derbasî warê peykervaniyê bû, bêyî ku waneyên ekadîmî

bibe û bi awayekî serbixwe .Karê wî yê rojane hesin karî ye, lê huner ji wî re wek behre dimîne û di hunerê de dijî.

di hevdîtina Welat bi Zozanî re wilo ragihand:

“Ji ber paşguhxiştina sazî û civakê ev kar gelekî veşartî dimîne, û ji ber destelata Ba's min bi metirsîniyê peykerên xwe saz dikir, ji ber van tiştan gelek berhem bi bê dengî û bê ronî bi dawî dibû”.

Zozanî gelek berhempêşkêş kiriye, ji tabloyan û peykerên kesayetî û filiklorî, bêtirî 25 peykerên kevirî û bazîlî ji karê destê wî hene, lê her yek vê gavê li devereke ne, û van rojan Zozanî li ser peykerê Kawayê hesin kar dixebite, da ku ev peyker çihê xwe di destpêka derbasbûna Serê kaniyê bigre, ji hêla hatina Dirbêsiyê.

Û li ser xwestek û hêviyên wî bo pêşerojê, bo me wisa axivî û got:

“Ez hêvî dikim ku milletê me li hunerkariyê xwedî derkevin, û bal û guhdanê bidin vî aliyê giring, û ez amademe ku ez peykerên kesayetî, dîrokî, filiklorî pêşkêş bikim bi şêweyên ceywaz” ■



Nirxên avahiyan li "Qamişlo"

Xunav Kano

Di encama şerê ku ev sê sal in li Sûriyê rû dide, gelek komkujî û penaberî çêbûye, û xelkên ku li aramiyê digerin ji neççarî ji deverên pevçûnan ber bi deverên hinekî aram ve baz didin û koç dikin, ji wan deverên ku hinekî aramî li wan hebû di van salên şer de li Sûriyê herêmên kurdî bûn yên ku bi sedhezaran ji penaberên sûrî li xwe girtin.

Ev koçkirina ber bi herêmên kurdî ve li Sûriyê ku nedihat bawerkirin bigihêje vê radeyê gelek kirîz li van herêman afirandin û di serê de buhabûna nirxê avahiyan.

Derbarê vê mijarê "Me'sûm Bîco" ku ew xwedanê navenda "Selahedîn" a kirîn û kirêkirina avahiya ye li Qamişlo di hevdîtinekê de bo kovara Welat got: "Ji ber buhabûna madeyên avakirî û daketina nirxê lêreya Sûrî wek mînak nirxê blokê berê bi 12 L.S bû û aniha bi 50 L.S ye li gel buhabûna nirxê çemento û sotemeniyê ev kirîz hat derket holê û nirxên avahiyan bilind bûn, li aliyekî din berê karker di rojê de bi 200 L.S kar dikir lê aniha û ji ber buhabûna jiyane bi 500 an 1000 L.S kar dike."

"Bîco" û bo bêtir roniyê deyne li ser vê mijarê xeştek bi nirxên avahiyan li Qamişlo da kovara Welat:



Rûber	Navçe	Berî şoreşê	Piştî şoreşê
M ² 250		Mitro bi 5000 L.S	Mitro bi 30,000 L.S
M ² 190	Kolana Heseke	L.S 3,000,000	L.S 7,000,000
M ² 140	Taxa Xerbî	L.S 2,700,000	L.S 5,000,000
Xaka çandiniyê	Riya balefirgehê	Donim 400 dolar	Donim 400 dolar

Me'sûm Bîco yê ku di warê kirîn û firotina avahiyan kar dike di dawiya gotina xwe de bo Welat dibêje: "Lê tevî van nirxên bilind tevgera kirîn u firotinê heye.."

"Ciwan Mehmûd" ciwanek ji Qamişlo ye u ji berî 2 salan xaniyê xwe ji firotinê re pêşkêş kiriye, derbarê rewşa nişteçibûna xwe ji kovara Welat re got: "Min li bajarê Şamê kar dikir û ji ber nearamiyê ez vegeyriyam Qamişlo û min ji xaniyê xwe yê li ser riya balefirgehê bar kir u min li taxa Siyahî ji xwe re xaniyek kirê kir lê pirsgirêka tunebûna avê dihêle em neçar bin wê bikirin.."

Avahî pêwîstiya herî girîngê di jiyana welatiya de û li Qamişlo tevî peydabûna xaniyan lê nirxên bilind nahêlin ku welatî bi cih û war bin.

Bi karanîna zarokan di karên giran de

Mihemed Alûcî

Dibêjin ku zarok pêşeroja cîhanê ne ev pend gelek caran li ber guhê me dikeve, lê eger wisa be gelo çima em guhdaneke mezin nadin zarokên xwe?!

Di welatê me de zarok têne paşguh xistin, û tu giringî bi behreyên wan naye danîn, û ew rastî rîftarên pir ne baş dibin, gelek caran em wan pêxwasî li ser kolanan dibînin.. servekirî li ber germa havînê, li ser şeqaman dilêzin, û jiyana wan rastî metirsiyê dibe.

Lê diyardeya herî metirsîdar ku dijî mafê zarokan li welatê me pêk tê (bi karanîna zarokan di temenekî biçûk de, di karên giran de)

Li gorî hin amarên ku ketin ber destê me tê diyarkirin ku rêjeya zarokên ku li Rojavayê Kurdistanê devst ji xwendinê berdidin 20% ye, û yên ku dikevin karên giran de 10% ye, dibe ku ev rêje piştî kirîza Sûryê zêdetir jî bûbe.

Gelo sedem çine ku kesûkarên van zarokan wan dixin karên giran de?!

Me jî wek kovara Welat, me xwest ku em lêkolînekê derbarî vê diyardeyê çêbikin, û di encam de ji me re hat diyar kirin ku sedemên sereke ji vê diyardeyê re evin:

1-hejarî: ji ber rewşa abûrî ya nizim a ji gelek xêzanan re, ew neçar dibin ku zarokên xwe ji dibistanan derxin, û wan têxin karekî de, ku sûdeyê diravî jê werbigirin.

2-nezanî: gelek kes di civaka me de, ji ber kêmbûna asta wan ya zanistî dibînin ku xwendin ji zarokan re bê sûdeye, û tu pêşerojek baş bo wê tune ye, lema ew dibînin ku zarokên wan ji biçûkanî ve fêrî


krekî bibin, ewê baştir be ji pêşeroja wan re, û qezenca wan a diravî jî, ewê bêhtir be.

3-nebûna sizayên pêwîst: tevî ku gelek yasa hene li dijî bikaranîna zarokan di karên giran de, lê ew têne bînpê kirin, ji ber ku kesên berpirsyar van yasayan cî bi cî nakin, û kesên ku bînpê jî dikin, nayên sizadan!

Çareserî ji vê pîrsgirêkê re çine...??

1-alîkariyên abûrî: peyda kirina kresteyên pêwîst ji zarokan re ta ku bikaribin xwendina xwe berde wam bikin bêyî ku bibin barek giran li ser malbata xwe ya hejar, û ev yek ji dewletê û komelên civaka sivîl tê xwestin, ku alîkariyê bi malbatên hejar re bikin ta ku bikaribin zarokên xwe bi xwendin bidin.

2-siza: pêwîste ku dewlet yasayan cî bi cî bike, û kesên ku mafê zarokan bînpê dikin, bêne sizadan, û ev yek dibe rêgir li ber vê diyardeya metirsîdar. ■



ŞENGAL...

Ehmed Sifûk



Piştî çiroka Şengala xemgîn di 3/8/2014 an de û talankirina bi hezaran ji Kurdên me yên Êzîdî,berê wan ket Rojavayê Kurdistanê ..

Jimarek mezin ji wan penaberan gihan bajarê Tirbespiyê û gundên derdorê wek Til Xatûn,Alereşê û çend deverên din.Ew kes jî hatin belavkirin di nava malbatên xelkên Tirbespiyê tevî jiyana wan a nexweş û belengaz.

Piştgîriya wan penaberan kirin bi

hemû rengên alîkariyê wek pere,cil û pêdiviyên gerek û sereke,wan wisa name gihandin Şengaliyan ku ew ne bi tena xwe ne di vê rewşê de.

Û di hevdîtina kovara” Welat “ bi zarokekî biçûk li ser wê komkujiya ku bi sedan xort û keç qurban tê de çûne axivî û got: renek pir giran ji tundiyê min dît,tu carî ji bîra min naçe..!

12





Gelo çima ez hêj di hundirê welat de me ?

Gulal Liyanî

Rewşa jiyane ya zehmat li seranserê Sûrî û bi teybetî li herêmên Kurdî li Sûrî hişt ku bi hezarê milet penaber bibe ji dervî welat, çê dewlatên Ewropî yan dewlatên li li hawîrdorên Sûrî.

Lê beşek ji milat di hundirê welat de mane û berxwedanê dikin, sedman ji xwe re dibînin da ku ji axa welatê xwe bernedin û dûr nekevin, pirsas me ji ciwanên bajarê Girkê Legê re :

Ma gelo çima te jî dest ji welatê xwe bernedaye? -

Dilkêş Hiznî: Derfeta çûna Ewropa ji min re hat lê ez neçûm ji ber ricêma be'es bi dehê salan kar û xebat kir da herêma me vala bike, lê mixabin îro welat vala dibe bêyî ku ricem têkildarê û destê xwe ji wê bîne.

Cemîl Se'îd: Dîroka Kurda tê naskirin ku her 100 salî carekê derfet jê re tê ku mafê xwe bi dest bixê, ez mame di hundirê welat de belkî ez karibim karekî ji netewa xwe re bikim, û ez li dijî derketina ciwana me ji ber herêma me arame û welat bi destê ciwnna tê avakirin.

Kamîran Tehlo: Ez ne li dijî koçberiya ciwana me, ji ber ku tu maf û cihê ciwanan di nav tevgera Kurdî ya rêzanî tune û ciwan bi kar dimînin di hundirê welat de, û pêşerojê ne diyar li bendî me ye.

ji lewra ez dibînim ku derketina ciwanan ji

dervayî welat ew dê baştir be!

Kastiro Alo: Ez çûm li ser sînorê Turkî da ku ez derbas bibim, û berê xwe bidime Ewropa lê dema ku min dît zarok li ser sînor çawa bi zehmetî derbas dibin, zarokê min hatin pêşiya çavê min, û min got ewê çawa bi vê zehmetiyê derbasbin?, dîsa ez vegariyam malê li nav zarokên xwe!

Her mirovek ji xwe re sedmekê dibîne ta ku dest ji axa welatê xwe bernede, hêvî ewe ku kesên berpirsyar ji herêmê re alîkabin bi ew kesên ku di nava herêmê de mane ■



Koçberiya bi hezarên Şengaliyan û hatina wan li Rojavayê Kurdistanê

Fener Ehmed

Meha Tebaxê mehek ceywaz bû ji teva xelkên Rojavayê û bi taybetî ji xelkên Dêrikê re, ji ber ku ew ketin pêş ezmûneke dijwar û awarte de ku hêza xwe bi cih binin di çareserkirin û hembêzkirina aloziyan bi dilekî fereh.

Komkujiya ku bi serê Şengaliyan de rûda li Iraqê ji hêla Daişê ve tenê ji ber ku ew Kurdin û ola wan Êzîdî ye.

Kongeha Newroz pêşwaziya koçberan kir bi dilîniyek germ, dîmenên Şengaliyan diyar dikir li ser rewşa ku ew di nav de derbasbûne ji destê komên çekdarên radîkal.

Şaha Memo ya ku heyştê salî ye me wê dît di bin konê Heyva Sor de, ji ber

rewşa wê ya tenduristî li paş bû ji zehmetiya bêhîndanê û êşa sîngê, Şaha ji me re wilo got:

“Min tucarî wek vê fermanê nedîtiye, û ez bawerim ku ewê kesek ji me van rojên reê jibîrneke, li Şengalê termên zarok û ciwanan li ser hev hatibû kom kirin, û komên çekdar jin û mêr, zarok û ciwan tevde serjê dikirin bi dilekî sar û şad wan dikuştin, û em ji nava destê mirinê reviyam”.

Saman, zarokekî biçûke, gihişt kongeha Newroz û hêj ji girî û qîrînê rizgar nebibû, temenê wî pênc sale, û dayika wî ya bi navê Hesna wisa got:

“Ev bû sê roj û şev ku em bi rê ketine, bi peyatî di vê germê de û bê xwarin û av, ta vê gavê em nizanin çawa em gihiştine vê deverê, ez hêj bawer nakim ku em saxin!”.

Ji hêla xwe ve xelkên Dêrikê zehmetiyek mezin kişandin ji bo alîkariya birayên xwe yên Şengalî bikin.

Dr. Ehmed Şêxmûs yek ji karmendên Heyva Sor A Kurdî ye, got her rojê em derdora 1500 nexweşan di vê kongehê de pêşwaz dikin, lê em gelek ji wan dişînin nexweşxaneyê bajarê Dêrikê, sedem ewe pir ji van nexweşan rewşa wan gelekî ziyane ji ber meşa dirêj û bêyî ku xwarin û avê vexwin li dirêjahiya sê roj û sê şevan”.

Kongeha Newroz li Dêrikê ji hin alîkarî ji çend rêxistinên navnetewî wergirt, lê ew têra vê hejmara mezin ji koçberan nake ■

14



Diyardeya Karkirina Zarokan Li Kobanê

Şêrîn Temo

Dest ji lîskên xwe berdan,dest ji zaroktiya xwe berdan,piştî ku nîrên jînê yên dijwar ew neçar kirin ku wek mezinan kar bikin. Ta ku ew û xwedyên wan birçî nemînin, pirtûkên xwe yên dibistanê li dû xwe hiştin,xatir ji dibistanên xwe xwestin,xatir ji zaroktiya xwe ya qurçîff xwestin,kincên dibistanê bûne kincên kar û xebatê di dibistana jiyane de.. jiyana ku peyva zarok û zaroktiyê di ferhengê wê de nemaye.

Lê hîn heviya wan heye ku di demeke nêzîk de vegerin lînivîs û pirtûkên xwe , vergerin dibistanên xwe û vergerin zaroktiya xwe.

Piştî ku şoreşa gelê Sûrî li dijî rêjîma Be'is derbasî qonaxa leşkerî bû,rewşa welêt ya ewlekarî û abûrî hîn aloztir bû,ev bû sedem ku gelek kert li welêt birûxin ku kerta fêrkirîne yek ji wan kertan be.

Diyardeya karkirin zarokan yek ji diyardeyên bi metirsîne li Kobanê ye ku vê dawiyê bi awayekî balkêş û berferêh di civaka Kobanê de diyar bûye û jiyana zarokên bajêr dagîr kiriye,helbet ev jî ne ji valahiyê hatiye,lê ji ber gelek sedeman,wek aloziya abûrî ku Sûriya piştî şoreşê derbasê bûyî û bandora xwe avête ser jiyana biçûk û mezinên vî welatî,û hişt ku zarok dakevin qadên kar ta ku hinekî ji ev aloziya abûrî li asteya xwe û malbata xwe binixêmin, sedema din ya giring ewe ; rûxandina kerta fêrkirîne hemahema bi tevahî li Kobanê piştî ku piraniya dibistanan bûn penagehên koçberên ku ji gelek herêmên pevçûnê li Sûriyê(nemaze Ji Reqa û Heleb û Şam ê)hatin bajêr û ji neçarî di dibistanan de hatin bi cih kirin,û piştî ku herêma Kobanê ji gelek aliyên ve ji bin sîwan û pûteya rêjîma Be'is derket, ku yek jê, aliyê fêrkirîne ye, vê yekê hişt ku gelek dibistan dergehên xwe li pêş gelek şagirtên zarok bigirin,û ta ku xwedyên zarokan, zarokên xwe ji kolan û sincî û rewîştên kolan biparêzin,ew wan dikin ber karekî ku belkî sûdeya xwe li îro û li sibaya wan ya dûr hebe .

Diyardeya karkirina zarokên Kobanê xaknîgarî û sînorên Kobanê derbas kirine, her roj hinek zarok li gel malbatên xwe sînoran derbas dikin û derbasî Tirkîyê û Kurdîstana Îraqê dibin û li wir,li gel malbatên xwe wek mêr û karker û êdf kardikin.

Li Kobanê zarokên ku temenên wan di nava (10 –



15

14) salan de ye, gelek ji wan karên bi metirsî dikin,wek karê firotina mazot û gaz û benzîne li kêleka riyan, ku bandoreke gelek neyînî li tendirustiya wan dike.

Di hevdîtina me ya bi zarokê bi navê Mihemed Osman re,ku temenê wî 12 sale, ew dibêje:” Min du salan berî niha dest ji xwendin û dibistanê berda, piştî ku em (ez û malbata xwe) ji ber şer ji Helebê reviyay Kobanê,û ez neçar bûm ku kar bikin, ji ber bavê min, piştî ku em ji Helebê hatin, karê wî ji dest çû”.

Û di hevdîtina me ya bi bavê zarok Mihemed Osman re ,ew dibêje :” min ne dixwest ku kurê min zaroktiya xwe neji,û min ne dixwest ew berî demên xwe bibe mêr, lê em çî bikin,nîrên şer ji xwestekên me xurtirin!”.

Di vê derbarê de derûnas Tolîn Mihemed dibêje ku zarok di vê qonaxê de pêdiviya wan bi jîwarekî saxlem û malbateke dilşad hene ji ber ku ew di vî temenî de bêtir meylarî derêtiyên civakî ne.

Berpirsyariya karkirina zarokan û bêparkirina wan ji mafê fêrbûnê dikeve ser milê malbatê,û pêwîste ku komele û sazîyên sîvîl xemxweriyê bi zarok û zarokperweriyê bikin, û hemû destyên civakî û rêxistinên hawarçûnê destên xwe bidin hev ta ku karibin danûstandin û serederiyê bi vê diyardeyê re bikin û rewşa zarokan ya abûrî baş bikin û şiyariyê di nav gel de belav bikin û wane û sêmnarên şiyarkirîne ji bo malbat û xwedanên zarokan li dar xînin,û encamên ev diyardeya ku bi awayekî berferêh li Kobanê belav bûye şîrove bikin

Li Gemrûkê aşavekî 200 salî...

Li gundê Gemrûkê yê navçeya Ma'beta ya Efrînê şunwarê aşaveke kevnar ku vedigere nêzî 200 sal berê, hate dîtin.

Aşav di sedsala 18'an hatiye avakirin û di sala 1992'an piştî ku tûnela ava avdanê hate çêkirin, aş bi temamî hate rawestandî û hilweşiya.

Yek ji aşên kevnar ên herêma Efrînê aşê gundê Gemrûkê ye û beriya nêzî 200 sal li gundê Gemrûkê yê navçeya Ma'beta ya Efrînê li ser çemê Efrînê hatiye avakirin. Derbarê dîroka aşavê de welatîyê bi navê Mehmûd Birîm ê ji gundê Gemrûkê wiha got:

"Dîroka avakirina aş li gorî ku min ji bapîrê xwe bihîstiye, vedigere nêzî 200 sal û ji aliyê malbateke Ermenî ve hatiye avakirin.

Aşav li ser çemê Efrînê hatiye avakirin û bi avê dihat gerandin. Ava çem di cihokên taybet re diherikî û perwaneyên aş ku bi kevirê Bazilt (yên wekî destarên mezin hatine çêkirin) ve hatine girêdan, digerandin.

Birîm diyar kir ku di aşavê de du kevirên bazilt (destarên mezin) hebûn û ji ber lehiyan di bin bermahiyên lehiyan de man.

Birîm da zanîn ku aş ji bo hêrandina genim dihat bikaranîn û ard çêdikir. Vî aşî pêdiviya hemû gundên derdorê ji ard pêktanî.

Birîm di dawiya axaftina xwe de got ku ji ber lewazbûna pîlanên rêjîma Ba'sê di aliyên projeyên çandiniyê de, aş ji sala 1992'an ve bi temamî hate rawestandî. Her wiha ji ber ku cihoka ava avdanê di nivê aşê kevnar re hate birîn û sulava li ser çem jî hate hilweşandin

Jêder -Anha



Şîrdana zarokan a asayî



Şîrdana zarokan bi meh u salên jiyana zaroktiyê ve girêdayî ye, Zarok ta şeş mehiya xwe, tenê şîrê dayika xwe dimije u li ser wê jiyana dibê, lê car caran hinek dayik xweşava sêvan darbasî nav şîrdana zarokê dikin.

Taybemendiyên şîrê dayikê

Taybetmendîya şîrdana asayî bi hin rewşên şîrê dayikê ve girêdayî ye, di gel ku şîrê di kargehan de çêdikin vitamin, pirotîn û gelek elementên din tevî wê dikin, û paqij tê parastin lê şîrê dayikê ji wan şîran hemiyana paqijtir û bi sûdetire, çimkî şîrê dayikê:

1) Bi sivikayî di hundirê hûr de tê helandin û parçekirin, nîşana wê jî ewe ku pirotîn û elementên şîrê dayikê bi hesanî ji hêla zikê zarokê ve tên mijandi.

2) Şîrê dayikê şîrekî herî paqije û mikrob nikarin derbasî nav vî şîrî bibin, ji ber ew di pêsîra dayikê de parastîye û zarok sererast şîr ji pêsîrê dayika xwe dimijîne.

3) Radeya germahiya şîrê dayikê her tim wek heve (di nav bera 36.5 û 37.5) de ye ev yek pir bi sûde ye ji ber zarok çî bi roj û çî bi şev şîrek, ku radeya germahiya wî weke heve, ne germ û ne sar vedixwê.

4) Gelek hêmenên tendûrustiya zarokê di şîrê dayikê de hene wek : pirotîn, gilobolîn, vîtamîn, şekir û hin elementên din, ev yek zarokê ji gelek nexweşiyên diparêze û berxwedana laşê wî hember nexweşiyên pirtir dike, bi taybetî nexweşiyên înfeksiyonî, kulbûna roviyan û hin nexweşiyên din..

5) Şîrdana asayî girêdanek heskirinê di navbera dayik û zarokê de dafirîne, nîşanên vê yekê jî ewin : ku dayik di nîvê şevan de bi kêf û şahî ji xewa şêrîn radişe û li gaziya zaroka xwe xwedî derdike û wî ji pêsîra xwe têr dike ev

yek hem hezkirineke bê sînor di navbera wan de dafirîne, hem jî aramiyekê dide wan.

6) Du sûdeyên ekonomî jî yê şîrdana asayî hene :

A – Ekenomîkirina demê Ji dê re..

B – Ekenomîkirina diravî ji bav re..

Ji ber ku dayik tu demê li amadekirin û germkirina şîr wînda nake, û bav jî naçe bazarê şîr nakire çimkî her tim şîrekî germ, parastî, paqij, û bi sûde li mal heye.

Çend şîret ji bo dayika ku şîr dide zaroka xwe-

1) Gerek dayik dermanan di mehên şîrdanê de nexwe, ji ber derman li hev siwariyên kîmyayî ne û dibin sedema zîyanê li tenduristiya zarokê..

2) Berî her şîrdanekê pêwîste dayik serê pêsîrê xwe bi kolonya yan bi avê paqij bike

3) Pêwîste dayik di mehên şîrdanê de tûtîne nekşîne û alkegolê venexwe

4) Pêwîste dayik cihekî taybet ji şîrdana zarokê re amade bike û bi awayekî ku zarok karibe şîrê xwe bi rehetî bimije..

5) Piştî her şîrdanê, pêwîste ku dayik zarokê bide ber sînga xwe û piştî wî bi destê xwe bi teptipîne ji bo ew bayê ku bi mijandinê re ketibe zikê zarokê derkeve.



Û ev yek zarokê ji qolinc û zik êşan diparêze! ■





Hevalno...
Pisîka Zînê winda bûye.
hûn karin alîkariya wê bikin?

18



Mizgînî:

nêzîk kovara we, Kovara
Kulîlkên WELAT
dighe destê we.



PEYVA WENDAYÎ

Peyva wendayî ji 7 tîpa pêk tê, navê êlek pir mezine li Başûrê Kurdistanê.

Kamîran-konê reş-rewşen-dilawer-arşek-miqdad-keleş-ronî-xan-namî-soz.

X	N	M	Ş	E	L	E	K
K	R	A	I	S	O	Z	N
A	O	E	R	Q	E	W	A
R	R	N	W	Î	D	Ş	M
O	N	Ş	Ê	A	M	A	Î
N	A	N	E	R	L	A	D
Î	X	V	A	K	E	I	K
N	E	Ş	W	E	R	Ş	D

--	--	--	--	--	--	--	--

Jimara bi tenê

Cihê vala di her malikê de bi jimara gerek dagre, lê divê ku tenê carekê jimar were dagrtin di her malekê de, û herweha divê ku tenê carekê were dagrtin li ser xêza asoyî û serjêr.

						1		
8		7		5	3			
	3	2			4			
1		5		7		6		
	2		6		8		1	
		4		1		8		7
			8			2	7	
			2	6		5		4
		1						

XAÇERÊZ

Asoyî:

- 1-jîr – tersê ciwan.
- 2-kuranî (b).
- 3-dev li ken - nîşana welatan.
- 4-serûpê li gorî Silêmaniyê (b) – şan.
- 5-navekî keçane.
- 6-paytexta Êrdun – dera bê çandin û avahî.
- 7-dera ku genim dihêre (b) – tersê bir.
- 8-sawîr .

Serjêr:

- 1-yekem peyxember.
- 2-terse hat (b) – «ap» li gorî devoka aşîta (b).
- 3-navekî keçane.
- 4-navekî keçane (b).
- 5-dera ku bûzê çêdike – «ji bo çi» li gorî Soraniyan.
- 6-du tîp ji gotina «kew» - nîşana Filehan.
- 7-çar tîp wek hevîn – xaniyê pir mezin.
- 8- çar tîp wek hevîn – bê zar.

	1	2	3	4	5	6	7	8
1								
2								
3								
4								
5								
6								
7								
8								

Pend û şîretên Kurdî

- 1-pîştî xwe nede çerxa felekê, û xwe nede ber agirê xelkê!
- 2-av nabe şîr û qereçî nabin eşîr !
- 3-ji kar re siste, û ji nan re wek biste !
- 4-diz ji bazara li hev ketî hezdikin !
- 5-jina revandî wek rûnê helandî !

Ferhengok

- طيش serserîfî
 طيف pêjin
 طيلة dirêjayî
 طين herî-gîl
 ظالم sitemkar
 ظاهرة diyarde-nemand
 ظاهر bel-xuya
 ظريف şeng
 ظل sî-sêtav
 ظلام zeng-tarîbûn
 ظن guman-sawîr

Dêrik kampa Newroz...



Wêne: Şêro Hinde



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya


Welat

ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة

العدد (١٤) ٢٠١٤/١٠/١